



## Pêşketina xwendabûnê di qonaxên girîng da

Rênîşandanên pêşketina xwendabûnê deqîq nînin û divê tenê wek rêberekê bî bikaranîn. Her zarokê bi lezeke ciyawaz mezin dibe û pisportiya zimanê devkî, xwendin û nivîsînê teqez bi lezeke yeksan an hevdem pêş nakevin. Taybetmendiyên jêrê renga di pêvajoya pêşketina xwendabûnê da bî dîtin. Ev taybetmendî renga alîkariya dêbavan bike ku karên zarokê xwe baştir têbigihêjin.

Heke hûn difikirin ku zarokê we pîvanên pêwîst bi dest nexistine, digel bijîşkê xwe yê gelemperî an alîkarîgihanê civakî biaxivin, ji ber ku destwerdana wê/wê di vî warî da renga sûdmend û kêrhatî be.

### Seretayî (0 to 3)

0 heta 1 salî	1 heta 2 salî
<p><b>Zimanê Devkî</b></p> <p>1 heta 3 mehî: Bi zivirandina serî bertekê nîşanî dengê mirov dide. Dengên berdewam ên wekî dengê Bixebixê pêk tîne.</p> <p>4 Meh: Li hemberî "Na" û guhertina lehna dengî bertekê nîşan dide. Deng nêziktir li dengê axaftinê ne.</p> <p>6 heta 9 mehî: Bi zarê hin denga dike, hin peyvên pîrr tîne bikaranîn ku jibo wî/wê watedar in (<i>Dayê, Bavo, Kaka, pe-pe</i>). Bertek nîşanî navê xwe û hin xwestekan weke <i>Were vê derêdide</i>. Guh dide gotinên ku ji wî/wê ra tîne gotin û dest bi famkirina peyvên pîrr tîne bikaranîn (weke <i>Fincan, Şûşe</i>) dike.</p> <p>12 meh: Bi lipeyheviyê zêdetir dengên axaftinê an dengên ji bilî girînê jibo balkişandin û daxwazkirina hewcetiyan xwe bi kar tîne. Yek an du peyvên ron û aşkira bilêv dike.</p>	<p><b>Zimanê devkî</b></p> <p>Olan û dengvedan û mînakên sitranan zimanê wan ê sereke ye.</p> <p>Hejmara peyvên ku fam dike zêdetir ji hejmara wan peyvên e ku dikare wan bilêv bike.</p> <p>Dema ku kesekî mezin navê endamên leşî û wêneyan tîne ziman, zarok dikare amaje bi hinek ji endamên leşî an wêneyan bike.</p> <p>Dest bi bikaranîna "Axaftina telegrafî" (telegraphic speech) dike; Weke <b>Daddy home. Get milk. Bottle fall.</b></p> <p>Pirsên 1-2 peyvî dipirse; weke <i>Ew Çî ye?</i></p> <p>15 mehî: 4-5 peyvên bilêv dike</p> <p>18 mehî: 9-20 peyvên bilêv dike. Dikare pîrraniya dengên zimanê xwe yê sereke bilêv bike.</p> <p>21 mehî: Lîstikên ahengîn hez dike. Hewil dide ku tecrubeyên xwe parve bike.</p> <p>24 mehî: 150-300 peyvên bilêv dike.</p>

## 0 heta 1 salî

### Xwendin

Guh dide pirtûkên ku jibo wî/wê tên xwendin.

3 heta 6 mehî: Li wêne û dîmenan zîq dibe

9 heta 12 mehî: Pirtûkan bi pelandin, mêzekirin, çêjkirin, bêhnkirin û guhdarîkirinê dinirxîne.

## 1 heta 2 salî

### Xwendin

Guh dide pirtûkên ku jibo wî/wê tên xwendin.

Hevrêtiyeke zêdetir digel çîrokên ku jibo wî/wê tên xwendin dike.

Ji listikên ku dibare dibin û yê ahengîn û rîtmîk hez dike.

Ji mêzekirina li pirtûkên lêzanînan ku têda wêneyên amûrên cîhana zarokan hene, hez dike.

### Nivîsîn

Girtin û rakirina Pênûsa mûmik, gec û qelemê hîn dibe.

Tiştên nediyar dinivîse. Hêdî hêdî (1-2 salî) ji tevgerên xelekî yê mezin ber bi kişandina xêzê û nivîsîna tiştên nediyar va diçe. Renge peyamên "Nivîsandî" "Bi Dengê bilind bixwîne".

## Nûrabûyiyê seretayî (3 heta 5 salî)

### Zimanê devkî

2 heta 3 salî: Hevokên 3 peyvî bilêv dike; Weke **I do it. Mummy help me.**

3 heta 4 salî: Bazineya peyvên berfireh e û hevokên diwartir bilêv dike.

Dikare peyvên pirrhejmar bi kar bîne, dikare dirêj bike; Wek **sheeps, childs.**

Dikare lêkerên raborî bi kar bîne, renga -ed li lêkerên Bêpergal zêde bike. **runned, comed.**

Renga zarok dema axaftinê bi xwe ra biaxivin a karên xwe di dema cihanîne da şirove bikin; wek mînak Ez porê xwe şeh dikim. Ez nîgareke baş xêz dikim.

5 salî: Bazineya peyvên wî 2500-5000 hezarî ye.

Hinek ji zarokan dema bilêvkirina /l/, /r/, /th/ and /sh/ tûşî kêşeyê dibin.

Gelek diaxive, bi awayekî çalak beşdarî gotûbêjê dibe. Heke jibo mewqiyeye taybet peyvên wî/wê tunebin, renga jibo wê yekê peyvekê çêbike. Pirrî wextan hevokên balkêş dibêje, ji ber ku hewil dide ku dengê peyvên û bikaranîna wan di warên cûrbecûr da biciribîne.

Wek mînak. **4-year-old girl: I'm not being boisterous, I'm being girlstros!**

Wek mînak 3-year-old: **I love you, mummy.**

**Mum: I love you, too.**

**3-year-old: I love you, three.**

### Xwendin

Daxwaz dike ku jibo wî/wê çîrok bîn xwendin.

Hinek ji pirtûkan ji yên din zêdetir hez dike, ji xwendina wan a çend carî hez dike.

Wisa nîşan dide ku rûpelan diqulipîne û wêneyan jibo gotina çîrokê bi kar tîne an çîrokên nû bi alîkariya wêneyan çêdike.

Tîpên çapî di derdora xwe da nas dike û hewil dide ku wan bixwîne. Renga tîpa destpêkê ya navê xwe li derdora xwe têderxîne û fam bike.

Hinek ji hejmar û tîpan nas dike û wan di fontên cûrbecûr li derdorê û li pirtûkan peyda dike.

## Nûrabûyî (Pêşdibistanî / Baxçeya zarokan)

### Zimanê devkî

Xwedanê bazineya peyvên raderbirrîne ye.

Derdora 2600 peyvên bilêv dike.

Wateya derdora 20000 peyvên fam dike.

Mebesta xwe bi hevokên durust û lihevaliyayî dibêje.

Cûreyên hevokan bi kar tîne; Weke Pirsîn, Bêwêj, Xwebêjî.

Dikare destûrên yek an du qonaxî bişopîne; Wek mînak. *Solên xwe derxîne û dayne aliyekî.*

### Xwendin

Bi baldarî li çîrokên guhdarî dike.

Di bernameya xwendina komî û takekesî ya jixweber (ezber) da beşdar dibe.

Hêdî hêdî dikare peyvên nav nivîsê li gorî qafiyeyê pêşbînî bike.

Cûreya "Bikaranîna" (work) pirtûkê nas dike, têgehên wekî *cild, rû, pişt, nav, peyv û rûpelan nas dike.*

Şêwaza qulipandina rûpelan û tûşa xwendina tîpan nas dike; Wek mînak jor bi jêr, Çep bi rast.

Wek xwînerêkî pirtûkan tevdiqere. Pirtûkên nasyar "Dixwîne".

Tîpên alfabeyê ji ser hev nas dike û navê wan dibêje.

Têkiliya navbera tîp û dangan têdigihêje.

Hêdî hêdî şêwaza nuqtedanîne fêr dibe.

## Nûrabûyî seretayî (3 heta 5 salî)

### Nivîsîn

Sembol (Xêz, Xelek an şiklên din) jibo nîşandana peyvan bi kar tîne.

Ciyawaziya navbera resimandin û nivîsînê fam dike.

Dizane ku tîpên çapî peyama wan heye.

Renge bi elametên mîna tîpan an tîpên kopîkirî li derdorê jibo nîgareyên xwe navekî dayne.

Şiklên tîpan diceribîne.

Dikare tîp û şiklan bişopîne.

Dest bi bikaranîna tîpên rasteqîn û nişkêvayî jibo çêkirina peyvan dike.

Dest bi têgihîştina têgeha fontên cûrbecûr dike; Eva ku tîpek renga bi çend awayan were nivîsî: 'A a a'

Navê xwe dinivîse. Renge tîpên biçûk û mezin digel hev şaş fam bike û wan bi durustî bi kar neyne.

## Nûrabûyî (Pêşdibistanî / Baxçeya zarokan)

### Nivîsîn

Rêzikên nivîsînê dizane, dest bi nivîsîna ji jor bi jêr û çep bi rastê dike, navbera peyvan navbirekê datîne.

Dest bi nivîsîna hin tîpên alfabeyê û peyvên pîrr tîpên bikaranîn dike.

Navê xwe dinivîse. Hêdîhêdî rêzikên bikaranîna tîpên mezin û biçûk nas dike.

Carna renga hin rişteyên tîpên li pey hev bên dîtîn, ji ber ku zarok şêwaza nivîsîna tîpan temrîn dike.

Bikaranîna dengên peyvan jibo kîtekirina wan di dema nivîsînê da destpê dike. Bikaranîna dengê seretayî jibo vegotina peyvan di dema nivîsînê da destpê dike.

Renga navê tîpê dewsa dengê wan bi kar bîne; Wek mînak 'cAK' dewsa 'cake'.

Dikare bi Textekîldê tayp bike, peyvên destnivîs an peyvên pirtûkê bîzar dike.

## Seretayî (Baxçeya zarokan heta sala 1)

## Guhêzbar (salên 1 heta 2)

## Berfirehkirina (salên 2 heta 4)

### Zimanê devkî

Hêdî hêdî peyv û pêkhatayên hevokî yê lihevaliyayîtir û diwartir bi kar tîne.

Dikare gotina xwe jibo dabînkirina hewcetiyên di mewqiyên cûrbecûr da eyar dike.

Zimên jibo cûreyên bikaranîn û armanca bi kar tîne; wek mînak:

- Dabînkirina hewcetî û xwestekên kesane, wek *Fincanê didî min?*
- Kontrola liv û tevgeran, hest an nêrînen din, wek *Wî karî neke.*
- Danûstandin û pêkanîna têkiliyê digel kesên din, wek *Dixwazî li kêleka min rûnî?*
- Hilêxistina nêrîn û tecrubeyên kesane, wek *Ez dikarim nîgareyan bikişînim.*
- Hînbûna tiştên nû û pîvandina zanistê, wek *Çima ev yek qewimî?*
- Xeyilîn, pêkjanîna hewcetiyên nû, çêkirina çîrokan, wek *Ez dixwazim bibim şahzade.*
- Ragihandin, şirovekirin, wesifandin, wek *Ez kêzikê ji te ra didim nasandin.*

Dikare bi baldarî guhdarî bike û destûrên çend qonaaxî bişopîne, wek: Here derve û li nav erebeyê li kumê xwe bigere. Piştra were û ji min ra bibêje ku gelo te karî wê peyda bikî.

Seretayî (Baxçeya zarokan heta sala 1)	Guhêzbar (salên 1 heta 2)	Berfirehkirina (salên 2 heta 4)
<p><b>Xwendin</b></p> <p>Pirtûkîna derbarê têgehên nasyar an pirtûkên pêkhatî ji xêzên çîrokî yên sade û xwerû dixwîne.</p> <p>Hêdî hêdî û bi riya temrînê di warê xwendinê da serdest dibe.</p> <p>Dikare hin aliyên çîrokê pêşbînî bike.</p> <p>Dikare beranberiya (correspondence) Tîp-Deng, pişkên peyvê û zemîneyê jibo têderxistina peyvên nû bi kar bîne.</p> <p>Peyvên nasyar û pirr tîn bikaranîn di nivîsa çapkirî da têderxîne.</p> <p>Jibo çêkirina têgehê di dema xwendinê da, şopên wêneyî bi kar tîne.</p> <p>Xwendina xwe dişopîne û şaşitiyên xwe sererast dike. Bi neşiyaniya xwe di xwendina nivîsê da dihese.</p> <p>Dikare derbarê nivîsê bi axive û şopa çîrokê û jin hûrgiliyan bi bîr bîne.</p>	<p><b>Xwendin</b></p> <p>Dest bi xwendina pirtûkan derbarên mijarên seratir ji tecrubeyên kesane, pêkhatî ji seta çîrokî û ne çîrokî bi kar tîne.</p> <p>Nivîsê bi serdestî û hesteke zêdetir dixwîne.</p> <p>Di dema xwendina bi dengê bilind da rêzikên nuqtedanîne berçav digire; wek mînak lehna deng jibo veguherîna hevokê bo haleta Pirsînê diguherîne.</p> <p>Hêsantir û bileztir rê û rêbazên naskirina peyvan bi kar tîne.</p> <p>Dikare pêvajoya çîrokê, li gorî nasîna giştî ji Çîrokê, pêşbînî bike.</p> <p>Şaşitiyên xwe bi rê û rêbazên guncan bi kêrhatina zêdetir sererast dike. Gelek ji peyvan bi çavê xwe nas dike.</p> <p>Nivîsa ku nas nake, jinûve dixwîne.</p> <p>Derbarê kesayetî û rûdanên çîrokê diaxive.</p> <p>Nivîsên ne-çîrokî jibo bersivdana bo pirsên taybet an bidestxistina armancên taybet dixwîne.</p> <p>Çîroka di asta xwerû da fam dike. Dest bi têgihîştina têgehên lihevaliyayîtir di pirtûkan da dike.</p>	<p><b>Xwendin</b></p> <p>Nivîsnê bi serdestî û hesteke zêdetir dixwîne.</p> <p>Pirtûkên dirêjtir û diwartir bi awayekî serbixwe dixwîne.</p> <p>Di dema tûşbûna bi peyvên nenas, rê û rêbazên naskirina peyvan bi durustî û bi awayê xwebixwe bi kar tîne.</p> <p>Jibo derxistina têgehê ji nivîsê, rêbazên cûrbecûr bi kar tîne.</p> <p>Jibo bidestxistina têgehê (meaning), hewcetiya wê bi wêneyên herîkêm ên pirtûkê heye an qet hewcetiya wî tune.</p> <p>Xal û babetên sereke ji nivîsa çîrokî û ne-çîrokî kurt dike.</p> <p>Navbera tecrubeyên kesane, naskirina pirtûkan an cihanê û pirtûkên xwendî têkiliyê datîne.</p> <p>Nivîsê jibo bidestxistina têgehê û têkiliyan şirove dike.</p> <p>Şiyana têderxistina têgehê ji pirtûkê zêde dibe.</p>

Seretayî (Baxçeya zarokan heta sala 1)	Guhêzbar (salên 1 heta 2)	Berfirehkirina (salên 2 heta 4)
<p><b>Nivîsîn</b></p> <p>Nivîsa kesane çêdike da ku kesên din wê bixwînin.</p> <p>Nivîsên wî wekî rûnivîsa bilez ji zimanê devkî ye.</p> <p>Nivîsandina xweçêkirî û nasyar bi kar tîne.</p> <p>Banka peyvan jibo kîtekirinê bi kar tîne.</p> <p>Bi giştî dengê seretayî û carina dengê dawî jibo gotina peyvan bi kar tîne; wek mînak <i>pla</i> = Lîstin (Playing).</p> <p>3 heta 4 peyvan bi durustî kîte dike.</p> <p>Dikare dangan di peyveke take-kîteyî da ji ser hev veqetîne, wek <i>c-a-t</i>.</p> <p>Dikare hejmara kîteyên peyvan bibihîze an bihejmêre.</p> <p>Navbiradanîna navbera peyvan yekdest û rêzîkmend dibe.</p> <p>Nuqte û tîpên mezin û biçûk bi kar tîne.</p> <p>Nîşaneyên din ên wek Nîşanoka matmayînê (exclamation marks) û Nîşanpîrsan bi kar tîne.</p> <p>Dest bi bijartina şîkl an şêwazên cûrbecûr ên nivîsînê jibo armancên cûrbecûr bi kar tîne.</p> <p>Dest bi nivîsîna peyv û hevokan di bernameyên proseskirina peyvan (word processing programs) dike.</p>	<p><b>Nivîsîn</b></p> <p>Nivîsên bi cûre an janrên cûrbecûr dinivîse.</p> <p>Dest bi bikaranîna zimanê fermî li dewsa zimanê devkî dike. Nivîsîn hêdî hêdî vediguhere awayê nivîskîtir.</p> <p>Nivîsîna hevokan bi dirêjahî û lihevaliyayîbûna zêdetir.</p> <p>Zanista berfireh a Rêzîmanê jibo bandordanîna li ser nivîsînê bi kar tîne; wek mînak Rengdêrê (adjective) jibo şirovekirinê bi kar tîne, wek <i>Dara bilind a Kesk</i> (tall green tree).</p> <p>Peyvên nivîsa (spell) xwendî bi durustî kîte dike.</p> <p>Bikaranîna mînakên Kîtekirinê di peyvên nenas dest pê dike.</p> <p>Dikare çend kîteyan di peyvan da dibihîze û wan jibo kîtekirinê bi kar tîne.</p> <p>Gelek ji peyvên pîrr tîna bikaranîn bi durustî kîte dike.</p> <p>Bikaranîna Pêvajoya nivîsînê jibo çêkirina berhema dawiyê (pêşnivîskirin, Edîtkirin, Sererastkirin (revise)) dest bi dike.</p> <p>Bala xwe dide ser aliyên teknîkî yên nivîsînê.</p>	<p><b>Nivîsîn</b></p> <p>Peyvên nivîsa (spell) xwendî bi durustî kîte dike. Dest bi danîna peyvên lihevaliyaîtir û dijiwatir û zimanê nivîskî di nivîsa xwe da dike.</p> <p>Heke pêwîst bike dikare peyvên teknîkî, wek <i>Kîsikdar</i> (marsupial), <i>Guhandar</i> (mammal), di nivîsa lêzanînen tîkildarî heywanên Awstralyayê bi kar bîne.</p> <p>Berhemên cûrbecûr ên nivîskî çêdike. Pêkhatayê li gorî armanca taybet dibijêre.</p> <p>Pêvajoya nivîsînê ji çêkirina berhemê û danûstandina tecrubeyê digel hevtemenên xwe bi kar tîne.</p> <p>Berhema xwe rabeî xwendekarên din dike û pêşniyarên xwe digel xwendekarên din parve dike.</p> <p>Dest bi bikaranîna Paragrafê jibo çêkirina nivîsên bilindtir û dirêjtir dike.</p>

## Çavkanî:

The Agenda for Children, [Literacy development milestones](https://letstalkcambridge.org/wp-content/uploads/Literacy-Development-Milestones-new-logo1.pdf) <https://letstalkcambridge.org/wp-content/uploads/Literacy-Development-Milestones-new-logo1.pdf>

Halliday, M. (1973), *Explorations in the functions of language*, Edward Arnold, London

Hill, S. (2012), *Developing early literacy: assessment and teaching*, Eleanor Curtain, South Yarra, VIC

Vukelich, C. Christie, J. and Enz, B. (2002), *Helping young children learn language and literacy* Allyn and Bacon, Boston

Waterland, L. (1988), *Read with me: An apprenticeship approach to reading*, Thimble, Stroud